



# HÊVÎ

kovara kurdî ya zarokan

Hejmar: 3 - Tiran/1981





# HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar: 5 Heziran/1981

## TÊXISTINÎ

ROJA ME PÎROZ BE.....	2
QIJKA ÇIL ZMAN Û KORTELA BE ZMAN....	4
GURIYE KEVOKVAN.....	7
EM ORGANÊN XWE BI NASIN.....	13
HATINA ROJ Û ŞEVE .....	15
REKA ZAROKAN(HELBEST).....	16

---

## ROJA ME PÎROZ BE

Koma Mîlletan, dî sala 1979 meha Heziranê de, bî biryareki hemû zarokên dinê şakır. Ev biryar mîzgîniya SALA ZAROKA bû. Lî her derê dinê tevgerên cûr be cûr hat danin. Dî derheqên zarokên dinê film çê kîrîn. Kampanya jî bo alikariya zarokên welatên paştamayi, hat vekîrîn. Komîteke jî Koma Mîlletan, bî xebateki dîr û dirêj, rewşa zarokên dinê diyarkîrîn. Roja 1'ê Heziranê jî bû ROJA ZAROKAN YA NAVNETEWÎ.

Zarokên dinê %50-60 hêj dî zîkên diya xwe an jî piştî hatîna wan ya dinê, dîmrîn. Jî alî dîn jî bî milyonan zarok, dî bî taluka birçî bûnê de ne. Tenê lî Afrika, iro bî hezaran zarok jî tunebûnê, jî xîzaniyê, jî hemûyan gîringtîr jî ber şer dîmrîn an jî dî rîya mîrî nê de ne.

Nemaze dî şerên çekdari de, yê ku pîr perîşan dîbîn, bê bav û bê dê dîminîn, zarok in. Jî bo ku zarok, nîkarî xwe bîparêzîn. Bî hezaran zarokên yê bê sûc û bê gune, dî şer de tîn kuştî, bîrîndarkîrîn an jî sêwî dîminîn.

Rewşa zarokên Kurdistanê jî, yê ku hêvi - yê Kurdistanê ne, bê dîbîstan, bê bîjîşk (doktor), bê nexweşxane ne. Jî panzde hezar kes re bîjîşkek dîkeve. Xwendî û nivîsandî, dî navgelê me de pîr kême. Lewra lî Kurdistanê bî kurdi xwendî û nivîsandî qedexe ye.

Îro, lî Kurdistanê zarok bî dê û bavên xwe  
ve tên bombekirin. Pîrên wan sêwî dîminin. Yên  
ku dê û bavên wan jî aliye leşker û polisên  
mêtingehkar ve têne girtin bê hêjmar in.

Welatên şerxwaz weki Emerika Yekbûyi, Îsra-  
il û h.w.d. dîxwazîn şereki mezîn derxîn. Çe-  
kên, ku tenê mirovan dîkujîn, çêdîkîn. Weki bom-  
ba NEUTRON, weki roketên yên bî bomba ATOM  
barkirî. Dî ciyê yek roketeki ya bî bomba a-  
tom barkirî, mirov dîkare bî sedan dibistan û  
nexweşxanan û ciyên listîkan avabîke.

Jî vê yekê vatîniyên me yên girîng, xebata  
aşiti û dijî çekdariyê ne. Rojên, ku bên yên  
me ne. Jî bo jîneke xweş û bê şer, em jî bîke-  
vîn nav tekoşinê.

Em daxwaza Kurdistanêke aza û serbixwe bo  
dibistan, ciyên listîk û pîtûkxanan bilind bî-  
kîn. Aşiti, bîla jî me re bîbe doza yekemin.

Roja me ya navnetewî pîroz be!

HÊVÎ

## QIJIKA ÇIL ZMAN Û KORTELA BÊ ZMAN

Qijik û kortelek hebûn. Herdu ciranên hev bûn û li Kurdistanê di daristanekê de hêlinên xwe çêkiribûn. Lê mîxabin, herdu ji bî zman nizanibûn.

Rojekê qijikê ji kortelê re got:

-Em herdu ji bî zman nizanin, were em herin, ji xwe re zman hin bibin.

Daristanên ku qijik û kortel li wir dijîyan û hêlinên xwe tê de çêkiribûn, gelek dûrê gund û bajaran bûn. Qijik û kortel, di ser daristanên kesk, şîn û xweş de difiriyan. Bî bask kutan, ser leqandin û bî leqe leqa nîkulên xwe bî hev re peyivîne û li hevkirîne. Firiyane û firiyane... Rastê riyekê mezîni hatîne. Li wir danîne. Di ser bî lîva baskan û bî nîkul leqandin, biryar dane, ku li qeraxê wê rê rawestîni û rewiyên ku bîni û biçîni, ji wan zman hin bibin. Li der û dora rê, bî tenê du dar hebûn. Ji wan daran yek dara berûyan û ya din ji dara guwîjan bûne. Darên berû, guli û şaxên wan dirêj in, pelên darên berû gir in. Ji vê yekê siya darên berû pîr xweş û hênîk in. Lê darên guwîj, ne wek darên berû ne. Pelên darên guwîj hûr in, siya wan hindîk in. Guli û şaxên darên guwîj, bî stîri ne. Stîriyên darên guwîj tûj in, di laşê mirov re diçîni.

Qijik bo ku şerrût û çavvekirî ye, difire û li ser dara guwîjê datîne. Ji kortelê re ji dara berû dimîne. Ew ji li ser dara berûyê datîne. Ew riya ku qijik û kortel li qeraxê wê danîne, riya Bêrtîyan bû. Bêrtî li Kurdistanê

pe wedi dîkîn. Kar û barê wan pez xwedikîrî  
ne. Bêrtî, biharan derî zozanan û heta havi-  
nê lî zozanan dîminîn. Dawiya payîzan jî, Bêr-  
tî dîçîn beriyê û zivîstanan jî lî beriyê dî-  
minîn.

Lî Kurdîstanê jî hêla bajarên Wanê, Bingolê,  
Elazizê, Muşê, Betlisê û Qersê û w. d. re dî-  
bêjî zozan. Zozan, havinan hênîk in, lî alîkî  
berf, lî alîkî dî çîneyî dîde nava mirovan ,  
pez lî zozanan ava sar vedîxwî, dîçêrî û qe-  
lew dîbîn. Berî jî lî Kurdîstan, jî hêla baja-  
rên Diyarbekîrê, Rihayê û Mêrdîn re tê gotîn.  
Havinan berî germ e.

Hîn kes dîbêjî, çaxa ku qîjîk û kortel çû  
ne ser rîya Bertîyan, wê çaxê bihar bûye û  
Bêrtî jî beriyê çûne zozanan. Hîn kes jî dîbê-  
jî, na, ew çax payîz bûye û Bertî jî zozanan  
ve ber jêr çûne beriyê. Lê, ev ne girîng e, ge-  
lê zarokên delal. Lê, Bêrtî, ew çax dî rê de  
bûne, ev bes e.

Kortel, lı ser dara berûyê xwe, kopelis kırıye, çûlîsandiye û hatına Bêrtiyan paye. Lı ser dara berû ya nerm û siya gûr, xewa wê hatiye. Dı xwe de çûye û raketiyê. Qıjık bo ku lı ser dara guwijê danibû, çiqas xewa wê hatiye, ew çax stiri dı laşê wê de şûye û xewa wê reviyaye. Bêrti ji hatine, dı riya xwe de meşiyane. Bêrti çı peyvîne, qıjık hemû hin bûye. Dawiya çûndına Bêrtiyan hatiye. Qıjıkê ban kortelê kırıye. Çı bıbine baş e? Ku kortel raketiyê. Kortel bı dengê qjıkê re şeyar dibe, dibîne, ku kes nemaye. Bêrti, hatine û derbasbûne. Bı tenê kuriyek (daşikek) wan, jı para maye û xwediyê wê "kurrr-kurrr" dibêje û ban wê dıke.

Qıjık û kortel dıfırın ber bı hêlinên xwe ve dıçın. Hım ser darıstan de, dı kêlekên hev de dıfırın, hım ji qala rewşa hinbûna zman dı kın. Dinêrın ku kortel bı tenê beja "kurrr-kurrr" hin bûye. Lewra kortel raketibû, dema xwediyê kuriyê ban kuriya xwe kırıbû gotibû "kurrr-kurrr". Bı tenê wê bêjê bihistibû û hin ji bûbû. Lê, qıjık lı ser dara guwijê nıkariybû rakeve, lewra stiri yên dara guwijê laşê wê de çûbû, ranekitibû. Jı vê yekê dema Bêrti hatibûn, derbasbûbûn çı gotibûn hemûyan hin bûbû. Qıjık lı serê kortel qureti dıkir û dest bı axaftınê kır:

-Wışşşş, wışşşş, qıjjjj, qıjjjj, kurrr, kurrr kurrrr, kurrrr, req, req, req, vayê, vayê.....

Kortela reben ji heq daye qıjıkê.

Jı bo vê yekê, jı qıjıkê re dibêjin "QIJİKA ÇİL ZMAN" û jı kortelê re ji dibêjin "KORTELA BÊ ZMAN."



## GURÎYE KEVOKVAN

Fermandar disa bang kîr:

"Ho Guri, ez jî te ra dibêjim. Dev jî van sêh ra berde. Tu nîkari seri bî mera derxi. Bivê nevē tê bêyi girtin. Vê gavê tu poşman bibi jî fêde nake. Tu lî kuyî derê, teslim be."

Gurri qiriya, got:

"Bibore, fermandarê berêz bo ku mî we gelek dapayin. Ez doxina şalê xwe bijdinim, niha têm Hela hûn cixarekê bîkêşin."

Fermandar bawer dîkir ku wê gelek hêsa Gurri bigre, bo wê jî pîr kêfxweş bû. Cixarek vēxist û axaft:

"Bî rasti zor başe. Ka em bibînin dengê te jî kijan cehenemê tê."

Gurri got:

"wê jî kijan cehenemê bê, jî ya ku bavê mî nî lê radizê."



Fermandar hêrs bû, qiriya:

"Ez bêterbiyeti naxwazim. Ê lî hember nasbî ke, dawiyê yaraniya bike! "

Hê wiha digot lî jor ewreki kevokan girt ser wan. Kevokên Gurri ji dî nav wan da bûn . Bızinê ji, berêvkê da dirik dîxwar û gulle dî kîr. Gurri rakir gullekê û avêt ber bî fermandar û bang kîr;

"Ha jî te re, bîbine ka ez lî ku me." wê gavê fermandar cixare dî devda, lî jor dî-nihêrt. Wexta, gullê jî orta eniya xwe da xwar geleki canê wi êşîya. Leşkeran dest bî êrişê kîrîn, lê kevokan jî dest bî gullebarandina ser wan kîrîn. Kevokan gulla dîxistî nîkulê xwe, bî hewa dîketî, pîştî davêtî serê leşkeran Gulle lî serê kê dîketî, dîqelaştî. Ev şer heta tarîti ket erdê dom kîr. Pîştî ku bû şev, leşker paşda veşerîyan. Gurri jî kevokên xwe û bızina xwe girt û jî ser xani daket. Kevokên dîn jî veşerîyan cîyê xwe.

Wê şevê jîna kir, bî perê ku Gurri dabû, sîf rek gelek dewlemend hazr kîr. Savar û nanê hişk her şev nexwarî. Jî kevokan ra genim reşandin û nefel û ceh dan bızinê.

Pîştî şivê diya wî got:


"Niha rabe kumîkê xwe têxe serê xwe, rast here ba qîza paşê. Mîn soz da ku ezê te bîşînim wîr."

Gurri şaş bû:

"Ê başe dayê çî îşê mîn heye lî ba qîza paşê?."

Diya wî got:

"Ka hela tu here, bînêre dîbêje çî."



Gurri ji kumîk da serê xwe û çû. Dî nav no  
tîrvana ra derbas bû ket oda keçîkê.

Wê gavê qîza paşê bî qevraşa xwe ya bawer  
pê tê re runîştîbû şivê dîxwar. Jî alîkî de  
dîaxaft dîgo:

"Ku Gurri zanîbûna ez çîqas jê hezdîkîm, s  
niyekê jî dereng ne dîma. Lê nava mîn dîqete  
ez dîbêm wê jî bal notîrvana va bêgîrtîn."

Qevraşê:

"Ax qet ne pîrse xanîma mîn, ez jî pîr dît  
sîm." go. "Dî ser ra paşê bavê te, îşev notîr  
vana duqat zêde kîriye. Lawê wezîr jî daye s  
rê wan."

Gurri lı teniştı qızıkê runişt, jı xwarına hınek gırt. Dı sıfrê da, bırıncı bı mırişk, bo rek, riçalên cur be cur hebûn. Qızık û qewraşê nihertın ku xwarın jı berêvkê da kêm dı-bın. Hêtek mırişkê jı nıfşkê de wında bû.

Qewraşê:


"xanima mın" go, "Tu çı dıbêji bêje, Gurri niha dı odê da ye. Ev karê wi ye. Mın jı te ra negotıbû hezar hunerên Gurriyan hene?."

Qıza paşê kêf kırıye gotiye;

"Gurriye mın, ger tu lı odêyi xwe nişan bı-de. Mın wer bêriya te kırıye ku.."

Gurri dengê xwe ne kır.

Qewraşê go:



"... ku ez livirim xwe nişan na de. Ka ez derom nay li derva bım."

Pıştı qewraşê çû, Gurri kumık jı serê xwe da ni. Qıza paşê carekê dit ku gurri li teniştâ wê ye. Gelek kêfxweş bû, go;

"Ma tu nabini, ez wek dina jı te hez dıkım. Were mın xelas bıke, an na wê bavê mın mın bı de lawê wezir."

Gurri:

"Tu qıza paşeki yi" go. "Tu çewa dıkari di wê mala meyi bı dûman wek koxê biji?"

Qıza paşê got:


"Pıştı ku li ba te bım, ez dıkarım her tıştı ti bıdım ser mlê xwe."


"Ez û diya xwe bı zorê karın nanê xwe qezenckın. Emê çewa zikê te têrkın? û di serda tu kar ji, jı destê te nayê."

"Ezê ji kareki hin bıbım."

"Ka tê çı hin bıbi?"

"Çı bıxwazi ez wi hindıbım."





"E başê wê çaxê" go Gurri "Ezê jî diya xwe ra bêjim bira hiri ristînê hini te bike. Ka çend roja bîpê. Ezê bêjim kinga bêm te birevinim"

Pîştî vê destpêkîrîn, şêrin şêrin dî nava xweda axaftin.

Ka bira ew lî wir jî xwere biaxîfîn, em werin ser lawê wezîr û ku serokê notîrvanabû ka çî dîke.

Gava, Gurri dihat nîk qîzîkê, ditîbû ku lawê wezîr serî ketîye ber û lî ber nobetê dî xew ra çûye. We gavê çîqas çeki wi hebûn hemî jî ser girtîbû. Gava lawê wezîr şîyarbû û dit ku çekê wi ne lî serî wê çaxê tê gîhişt ku Gurri ketîye qesrê. Notîrvana şand oda qîzîkê. Ye kî jî wan dafek lî qewraşa devê derî xîst û ket hundîr, ku çî bîvine? Gurri û qîza paşê lî hundîr rûniştîne, diaxafîn. Dest bî qîj-wîjê kîr:

(dûmahîk heyê)

## EM ORGANÊN XWE BI NASIN

J1 şevan şeveke zivistanê bû. Jêhat û Zêrin l1 mal, l1 teniştta sobê rûniştibûn. Zêrinê j1 xwe re b1 bebekên xwe dilist. Jêhat j1 b1 waneyên (dersên) xwe mijûl bû. Lê belê, her ku d1 çû, bina Jêhat teng dibû. Bistekê d1 ber xwe de poniji. Diya wan j1, j1 wan re gore çêdikir. J1 nişka ve Jêhat xwe avêt hemêza diya xwe. Herdu destên xwe d1 stûyê wê re b1r û got; "Dayê heyran, dayê qurban, ka rabe, em herin ma la Filit." Diya wî got; "Mîn berde. Dîvê ez i-şev vê gora te bîbîrîm." Lê Jêhat, dest jê bernedida û Zêrinê j1, j1 aliki ve ew diki-şand. Diya wan dit, ku tu çare jê re nine û n1 kare xwe j1 destên wan bîfilitine. Diya wan got;

"Baş e, de rabîn, lê hûn soz b1 mîn dîn, ku l1 wê derê hûn rehet rawestîn."

Jêhat û Zêrin, herduyan b1 hev re gotîn;

"Soz dayê, soz em ê dengên xwe dernexîn."

Diya wan rabû, kincên wan l1 wan kir û b1 rê ketin.

Çeko û Rûken j1 l1 mal, l1 ba pîrika xwe rûniştibûn. Pîrika wan j1 wan re xewroşkan d1 got. J1 nişka ve deriyê wan lêket. Rûken û Çeko herduyan b1 hev re bazdan, çûn deri vekî-rîn. Nihêrtin, ku Jêhat, Zêrin b1 diya xwe re l1 pişt deri rawestine. Çeko l1 diya xwe vege-riya û got;

"Dayê, wele vaye, Jêhat û Zêrin b1 diya xwe re hatin mala me."

Diya wan j1 ciyê xwe rabû û ber b1 wan çû Mêvan hatin hundir. Diya Çeko ci da wan û tev

de rûniştın. Pey lı hev pırsın, ketın şêwrê. Jê hat, Zêrîn, Çeko û Rûken hemû lı dor pirê civî yabûn. Hemûyan dixwestın, ku pirê jı wan re xewroşkan bibêje.

Pirê dit, ku nıkare xwe jı destên wan derxe, bê çare got;

"Baş e. Lê bı şerteki, ez ê jı we re bibêjim."

Gış dı ciyên xwe de sarbûn û lı pirê nihêrtın. Pirê, lı benda pırsên wan nesekini û şertê xwe got;

"Jı we ki, hemû navên organên xwe binavine, ez ê wê demê jı we re xewroşkan bibêjim."


Hemûyan bı hev re gotın;

"Ez, ez..."

Pirê got;

"Baş e. De Jêhat tu jı seri destpêbıke!"

Hemûyan bı dor, navên organan jımartın:



## HATINA ROJ Û ŞEVÊ

Sosin û diya xwe li ber pace bûn. Roj, hêdi hêdi diçû ava. Dinya jî ronahiyê dîket tari-tiyê. Çi seyr bû ? Roj, carna derdîket û carna jî diçû. Sosin pîr çavzêlkiya (meraqa) dîkir . Gelo çima wisa ye? Jî diya xwe pîrsî;

"Dayê, jî bo çî roj carna derdikeve û rona hi dîde me, carna jî, diçe û em dîkevin taritî yê?"


Diya Sosinê demek li keça xwe nihêrt, hînek ramand û got;

"Dinya me pîr mezîn e. Weki sêveke gilover e. Hîm li dora xwe hîm jî li dora roje digere. Gera li dora xwe di 24 seetan de tamam dîke. Jî vi 24 seetê re dîbêjî ROJEK. Dî gera xwe de alîki dînê ronahî jî rojê dîstîne. Dî vi a liyê dînê de roj e. Aliyê dîn jî rojê ronahî nastîne û tari ye. Ev alî jî şev e.

Sosin gotina diya xwe birî û got;

"Pîr spas dayê can. Ez têgihîştîm. Ger dînya me pan bûna, qet roj û şev nedibû."

"Bîjî, keça mîn ya jîr."





## RÊKA ZAROKAN



Kevokên aşti jî bo hêviyê dîşewitîn  
Jî evîna aşti û azadiyê dîşewitîn  
Jî ber jîna xweşi û ronahiyê dîşewitîn  
Hevalno! Aştixwazno! Delalno! Belangazno!  
Werîn meydanê û rûbara me jî bo jinê ye!

Hawar e lo! Hawar e, Hawar e lo! Hawar e  
Dijmîn pîr sîtemkar e, hawar e lo! Hawar e  
De pêk ve bîn! Rêberê me karker û cotkar e  
Hevalno! Aştixwazno! Delalno! Belangazno!  
Werîn meydanê û rûbara me jî bo jinê ye!

Em kevokên aşti ne, kulîlk in, çiyayî ne  
Em evîndarên mal, rez û zeviyên gundî ne  
Jelatê me fîreh e, pîr cîwan û şêrin e  
Hevalno! Aştixwazno! Delalno! Belangazno!  
Werîn meydanê û rûbara me jî bo jinê ye!

BEŞÎR BOTANÎ  
"Jî Rûbarên Sorav "



H Ê V Î:

ADRESS:

Kovara kurdi ya zarokan  
Kurdish children magazine  
Kurdisk barn tidning

Hêvi: BOX 5034 163 05  
Spanga-SWEDEN  
Postgiro: 439 33 42-3

PRIS: 3 kronor / SUBSCRIPTION-ABONE: 30 kronor per ar